Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1282 | 18-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 10 berhemên Newaf Mîro!

**Navenda Nûçeyan**



Newaf Mîro bi xebata salan rêzeke dirêj a berhemên edebî û estetîk diyarî wêjeya kurdî kir. Ev ked; ji bo ziman, wêje, çand û bîra kurdî gelekî qîmetdar e. Kesek, ku di biçûkatiya xwe de here Almanyayê, li wan deran di karên cûr bi cûr de bixebite, heta adaptebûnê gelek zehmetî û zorî bikişîne lê zimanê dayîkê ti caran jibîr neke, bi hemû hêza xwe, bi hemû "bîr"a xwe bi zimanê dayîka xwe berheman biafirîne, tiştekî çiqas pîroz e. Belê, îro Newaf Mîro bi tecrubeya temenekî, çiqas peyvên wî zanibûye yên jibîrbûyî hebe dîsa kiriye nav bîra kolektîf. Wî bûyer û gengeşeyên berê aniye nava me. Wî gelek kurgu afirandine. Wî hîs û dîroka bawermendên me yên êzîdî bilêv kiriye. Ew di berhemên xwe de ji bo rewşa gelê xwe yê kurd ê îroyîn li ber xwe ketiye. Wî hezkirinên me, bêriyên me, evîn û êşên me kiriye helbest, aheng daye peyvê.

Newaf Mîro îro ji bo me bûye berpirsiyar. Helbet bi vê berpirsiyariyê di nav nivîskariya îroyîn de cihê xwe ji bo siberojê girtiye. Navê wî ji niha ve li rûpelan hatiye nivîsandin. Mîro îro mohra xwe li bin çîrok, helbest, roman, berhemên lêkolînê xistiye. Tev li ser hev wî 10 berhem bi carekê, bi xebata saleke weşanxaneyê amade buye.

Meriv ji bo vê kedê çi pesnê bide wê nîvco bimîne. Ancax bi xwendina ew rêzikên xweş, ew peyvên nazik, ew hevokên şanaz em belkî bikaribin heqê wî bidin wî.

**Newaf Mîro û pênûsa wî**

Newaf Mîro, yek ji navên girîng ên edebiyata kurdî ya hemdem e. Bi zimanekî wêjeyî yê dewlemend û nêrîneke rexnegir a civakî, di berhemên xwe de kûrahiya çand û dîroka kurdî vedikole, di heman demê de bi awayekî hunerî mijarên gerdûnî yên wekî mirovahî, azadî û têkoşînê jî radixe ber çavan. Mîro, heya niha gelek berhemên hêja pêşkêşî xwendevanên kurd kiriye. Niha em wek Weşanxaneya Na'yê bi kêfxweşî agahdar dikin ku 10 berhemên bijartî yên vê pênûsa hêja ji nû ve hatin çapkirin. Di nav van berheman de çar ji wan çapa duyemîn in, ku ev yek nîşaneya eleqeya xwendevanan ye ji bo xebatên wî. Yên din jî berhemên nû. Van 10 pirtûkên ku ji aliyê Weşanxaneya me ve hatine çapkirin, ji hêla naveroka xwe ya dewlemend û zimanê xwe yê zelal ve balkêş in.

Nivîskarê me yê ku li Wêranşara Rihayê hatiye dinyê û ji sala 1987'an ve li Elmanyayê dijî, bi van berhemên xwe yên nû gaveke girîng bi pêş ve avêt. Mîro'yê ku berê bi pirtûkên wek "Ji Te Hezkirin", "Lehengê Tazî Keleşê Reş", "Dilop" û "Bend" hatibû naskirin, niha bi van 10 pirtûkan dîsa derdikeve pêşberî xwendevanên Kurd. Em bawer in ku ev berhemên nû çapkirî dê bala xwendevan û derdora wêjeya Kurdî bikişînin ser xwe.

**Berhemên hatine çapkirin:**

- Êzîdayê I, Helbest
- Êzîdayê II, Helbest
- Êzîdayê III, Helbest
- Gava Jin Li Jiyanê Neman, Çîrok
- Pîr Sebrî, Serpêhatî,Werger
- Bilûr û Teşî, Roman

- Gava Mirî Biaxife, Roman, Çapa Duyem
- Du Kes Yek Mirov, Roman, Çapa Duyem
- Dilop, Helbest, Çapa Duyem
- Sêwiyên Bi Dayik û Bav, Roman, Çapa Duyem

**Newaf Mîro,**

Di sala 1968'an de li Riha – Wêranşehrê li gundê Girêsirt jidayik bû. Piştî hijdeh salên li welêt hate Almanyayê û li wir bi cih bû. Newaf Mîro heta niha gelek roman, helbest û bi cureyên din berhem bexşand zimanê xwe. Ew hê jî li Almanyayê dijî û xebatên xwe yên wêjeyî didomîne.

**Berhemên Newaf Mîro;**

- Ji te hezkirin, helbest,2007, Weşanên Pêrî, Stenbol.
- Lehengê tazî Keleşê Reş, Roman, 2009, Weşanên Pêrî, Stenbol.
- Dilop, Helbest, 2010, Weşanên Han, Berlîn.
- Dilop, Helbest, Çapa Duyem, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Bend, Roman, 2011, Weşanên Han, Berlîn.
- Bend, Roman, Çapa duyem, 2014 Wêşanên Do, Stenbol.
- Sêwiyên Bi Dayik û Bav, Roman, çapa Yekem, 2014 Wêsanên Do, Stenbol.
- Sêwiyên Bi Dayik û Bav, Roman, Çapa Duyem, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Du Kes Yek Mirov, Roman, 2014 Wêsanên Do, Stenbol.
- Du Kes Yek Mirov, Çapa Duyem, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Gava Mirî Biaxife, roman, Çapa yekem, 2014 Weşanên Do, Stenbol.
- Gava Mirî Biaxife, Roman,Çapa Duyem, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Lehengê Dîl Keleşê Reş, Roman, Weşanên Lîs 2019 Diyarbekir
- Dilname , roman, Weşanên Lîs Diyarbekir 2019
- Lehengê Tazî , Çapa yekem, Weşanên Lîs Diyarbekir 2019
- Hitokê û Papûşko, seta 10 pirtûkên zarokan, Weşanên Morî zarok 2019 Diyarbekir
- Çivîka Zêrîn ya Gebrüder Grimm, 2020 werger ji Almanî, Weşanên Morî zarok Diyarbekir
- Êzîdayê I, Helbest, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Êzîdayê II, Helbest, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Êzîdayê III, Helbest / 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Gava Jin Li Jiyanê Neman, Çîrok,2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Pîr Sebrî, Serpêhatî,Werger, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.
- Bilûr û Teşî, Roman, 2025, Weşanên Na, Îzmîr.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Gundê Qereçox

## FERHENGA BIWÊJAN

**Te tizbiya min bi zilamtî berneda:**
- Te ez ji zilaman nejimartim; te ti qîmet neda min.
(Li gundan dema gundî ji bo karekî, ji bo tiştekî zilamên li gund dijimêrin, ji bo her zilamî libekê ji tizbiyên xwe berdidin. Carna dema navê zilamekî tê gotin, ji bo wî liba tizbiyê bernadin; wî ji zilaman najimêrin.)

**Te tizbiya me di nava zilaman de berneda:**
- Te ti hesab ji me re nekir; te em ji zilaman nejimartin; te pirsa xwe bi me nekir.

**Tifek û tifingek weke hev in:**
- Ji bo piçûkxistina mirovan tê gotin.

**Ti kes bi ser de namîze:**
- Guhê xwe nadiyê; qîmet nadiyê; hesab nake; layîqî xwe nabîne.

**Ti kes nizane ka bezê guhê wî ji kû ye:**
- Mirovekî beredayî ye.
(Dema hin dixwazin hina piçûk bikin bêqîmetnîşan bidin vê biwêjê bi kar tînin)

**Tu çi zû bûyî dîk, te çi zû bang da:**
- Te pir zû kir; min hêviya wî karî ji te nedikir.

**Tu çi zû bûyî kundir, te çi zû şax veda:**
- Bi heman wateyê.

**Tu çi zû bûyî kundir, çi zû stûyê te dirêj bû:**
- Bi heman wateyê.

**Tu di kû re bûyî dîk û di kû re te bang da:**
- Te pir zû kir; min hêviya wî karî ji te nedikir.

**Tu di kû re bûyî ga tu çûyî te bi kopê erebê ve rîx kir:**
- Te çima wisa kir; te çima xirab kir; tu kengê wisa mezin bûyî; kê tu kirî berpirs?

**Tu ne barê min î:**
- Tu ne hemberê min î.

**Xezal ji ber nêçîrvanan direviya, kîso digot halê me kûviyan her wiha ye:**
- Ew jî xwe tiştek hesab dike; ew jî xwe kêm nabîne; xwe nas nake.

**Xwe tîne rêza wî:**
- Xwe mezin dizane; xwe qure dike.
- Xwe zana dizane.

**Zêdegaviyan dike:**
- Serî radike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Aldar Xelîl: Biryarên Kongreya PKK'ê nîşaneya dûrdîtineke stratejîk e



Endamê Desteya Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl diyar kir ku biryarên di Kongreya PKK'ê ya 12'an de hatin girtin nîşaneya dûrdîtineke stratejîk û kûr e ku dawîkirina pêvajoyekê û destpêkirina pêvajoyekî nû ye.**R-4**

## 'Çareserkirina pirsgirêka koçberan bingeha çareserkirina pirsgirêka Sûriyê ye'



Berpirsê Têkiliyên Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso destnîşan kir ku çareserkirina pirsgirêka koçberan bingeha çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê ye û got, "Divê dagirkerî ji herêmên dagirkirî were derxistin û sûcdarên şer bên cezakirin."**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1282 | 18-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ÎSRAÎL Û ÎRAN; ŞERÊ HEGEMONIYÊ

Li Rojhilata Navîn şerê hegemoniyê her ku diçe dijwartir dibe û yên ku dibin qurban jî gelên herêmê ne. Di 13'ê Pûşperê de şerê Îsraîl û Îranê bi awayekî rasterast dest pê kir û roj bi roj girantir dibe. Rojnamevanê Kurd Kakşar Oremar diyar kir ku tu carî Komara Îslamî ya Îranê bi qasî îro rastî êrişên wiha giran nehatiye û got, "Ev şer wê bibe sedema bêhêziya siyasî, leşkerî û aborî ya Îranê. Di vê rewşê de pêwîst e alî û partiyên Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê li dor hev kom bibin, hêzeke hevgirtî ava bikin û dest bi amadekirina plan, proje û bernameyên xwe bikin."**R-3**



## 'Ji bo pêşxistina asta fikrê civakê parêznameyên Rêber Apo tên xwendin'



Endama Meclisa Bajarê Qamişlo Ayişa Elî anî ziman ku komînên bajarê Qamişlo bi hevkariya Kongra Star ji bo pêşxistina asta fikrî ya civakê, dest bi şêwirên xwendina parêznameyên Rêber Apo kir û ew ê heta ku Rêber Apo azadiya xwe ya fîzîkî bi dest bixe berdewam bikin.**R-5**

## Ji çiraxên wêjeya Kurdî



Helbestvan Dilovan Tildarî di sala 1955'an de li gundê Tildarê ji dê û bavekî Kurd (Mihemed - Henîfa), hatiye dunyayê, ew di malbateke neteweyî ya Kurdî de, ku aşiqê azadiyê ye mezin bûye...**R-7**

## Li hember hişmendiya pergalê têkoşîna her du zayendan tê xwestin



Hevseroka Desteya Jin a Bakur û Rojhiltê Sûriyê Edalet Omer diyar kir ku di mijara azadiya jin û misogerkirina mafê wê di têkoşîneke du alî ji her du zayendan tê xwestin û got, "Divê jin li ser esasê naskirin û têgihiştina cewher û xwebûna xwe, têkoşînê bimeşîne."**R-2**

**Civaka li xwe mukir neyê, ew nayê guhertin**
Nehîr pale R-2



**Di şerê Îranê de helwesta gelan**
Farûk Sakik R-5

**Dewletên netewe û hêzên serwer cîhanê dixin nav pêlên agir**
Zekî Bedran R-5

# Li hember hişmendiya pergalê têkoşîna her du zayendan tê xwestin

Hevseroka Desteya Jin a Bakur û Rojhiltê Sûriyê Edalet Omer diyar kir ku di mijara azadiya jin û misogerkirina mafê wê di têkoşîneke du alî ji her du zayendan tê xwestin û got, "Divê jin li ser esasê naskirin û têgihiştina cewher û xwebûna xwe, têkoşînê bimeşîne."

**Têkoşîn Amara /Qamişlo**

Her çendî cîhan û hişmendiya wê hatibe pêşketin jî lê hin zihniyet hene ku xwe dispêrin dîroka tunekirina jin û hebûna wê di hemû qadên jiyanê de. Vê yekê jî em di diyardeyên kuştina jin yên bê sînor de dibînin. Ev diyarde rûxmî hemû pêşketinên gilobal û avabûna tevger û rêxistinên ji bo jin, lê hê jî di tevahî cîhanê de tê berdewamkirin. Guhartina vê yekê zehmete lê ne ku nabe ye. Ji lewra li hember vê yekê pêwîstiya jin bi têkoşîna pir alî heye. Hevseroka Desteya Jin a Rêveberiya Xweser ya Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Edalet Omer di derbarê kuştin û tundiya li ser jinan ku tê meşandin de ji rojnameeya me re axivî.



**'Ji bo guhertina zihniyeta kevneşop têkoşîna jin'**

Edalet Omer diyar kir ku têkoşîna jina kurd ji dirêjahiya dîrokê heta niha bi awayek xort hatiye meşandin û wiha axivî "Di demên dawiyê de ji aliyê tevgera jin ve gelek kongre, konferans û komxebat hatin li darxistin. Ji bo ku dawî li tundî û şiddetên ku li ser jin tên meşandin û dawî li zîhniyeta zayendperestiyê bînin, gelek nîqaş û gûftogoyên ji aliye jinan ve hatin meşandin. Ji bo guhertina hişmendiya baviksalar a ku ji demên dûrûdirêj li ser jinê ferz dike û ji bo guhertina hişmendî û kevneşopiya ku di hûndirê civakê de li ser jin hatiye ferzkirin. Gelek xebat û çalakî pêwîstin ku jin bikaribe xwe ji wê hişmendiyê xilas bike heye. Bi taybet bi rêya perwerdeyan ji nû ve pênaseya zilamtiyê çiye? bike û li hember tiştên ku bi hezaran sal in li ser hatiye ferzkirin têkoşîn bike."

**Beramberî zilamê kapîtalîst zilamê sosyalîst**

Edalet Omer diyar kir ku ji bo guhertin û veguhertina zilam Rêber Apo dibêje ku di avakirina zilamê sosyalist de rola jin girînge û wiha bilêvkir: "Avakirina zilamê sosyalîst girînge Rêber Apo jî destnîşan dike ku divê di civakê de zilameke sosyalist çawa bê avakirin. Ji bo me mînakek nû ye li ser esasê rêgezên însanekî sosyalist yên çawa bê avakirin ev jî ferqa di navbera zilamê sosyalist û di navbera zilamê kapîtalîst de pir mezin heye. Ji bo wî jî di aliyê exlaqî de zilam pêwîste çawa be, ji bo edalet û wekheviyê bipejirîne, guhertin û veghertina zilam pir girînge ku bikeve xizmeta civakê. Çawa jin têkoşîn dike lazime zilam jî li hember zayendperestiyê têbikoşe."

**'Zilamê sosyalîst jiyana azad û wekhev esas digre'**

Edalet Omer destnîşan kir ku ger zilamê heyî ji koletiyê rizgar bibe wê demê hevjiyana azad wê pêkan be û wiha domand: "Zilamê sosyalîst û demokrat ji aliyê siyasî û sîstema hevserokatiyê de jin esas digre û baweriya xwe bi demokrasiyê tîne, dîktatoriya heyî a ku li ser jin tê meşandin qebûl nake û têkoşîn dimeşîne. Di her aliyê de mijara zilamê sosyalist girînge ji bo wî jî pêwîste xwe ji desthilatdariya heyî xilas bike. Zilamê sosyalist li ser esasê jiyanek azad û wekhev lazime Rêber Apo di hemû nirxandinên xwe de behasa hevjiyana azad dike ji bo ku zilamek karibe xwe ji koletiya ku kapîtalîzmê li ser ferz kiriye azad bike. Ger ew pêk werin mirov wê demê dikare bêje zilamek sosyalist hatiye avakirin û dikare bi jinê re jiyan bike."

**ji bo jin xwebûn esase**

Edalet Omer di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Di roja me ya îro de xebatên jin gihaştine astekî xort li kêlaka wî jî li çar parçeyên Kurdistanê û li dervay welat jin têne qetilkirin û tecawûzkirin û bi temenek biçûk têne zewicandin, ji bo derbaskirina wê hişmendiyê têkoşîn û berxwedaniyeke pir xurt dixwaze. Li Îraqê dixwazin zagonan biguherin taybet zarokên temen biçûk bidin zewicandin û ji bo xwe rewa û normal dibînin. Heman deme de li Îranê felsefeya Jin Jiyan Azadî ku bûye sloganek cîhanî ku herkesek hêvî di jina kurd de dibîne ji ber wî jî zilam êrişî têkoşîna jin dike dixwazin jinê bitirsînin ku dernekevin kolana û daxwaza mafê xwe nekin. Li Tirkiyê jî Rojane êrişên jinan dikin û li kolanan jin tên qetilkirin ji aliyê zilamê ku dixwaze jinê wek milkê xwe bibîne. Ji bo wî ji heta ku jin xwebûnê esas negre û xwe aydê xwe nebine wê bi gelek bûyeran re rû bi rû bimîne."

**'jin bi yekîtiya xwe dikare bibe bersiva êşa jinan'**

Edalet Omer axaftina xwe wiha bi dawîkir: "Pêwîst e jin dîroka xwe nasbike bi taybet bi Tevgera Azadiyê re jina berxwedêr û xwediyê dîroka pîroz, karî xwe perwerde bikin û têkoşîna leşkerî û hişmendî bidin meşandin. Her wiha yekîtî û hevgirtina jinan di hemû qadên jiyanê de, yek ji rêyên serxistina têkoşîna ku dane meşandin e. Ji lewra jin divê xwe li ser esasê felsefeya Rêbert Apo mezin bike, civakê bi rêve bibe û şerê pergalê bike. Bi vê yekê wê guhartina sîstema heyî, tundiya li ser jin tê bikar anîn û diyardeyên weke kuştin û bikaranîna jinê ji nava civakê bên qels kirin."

**Ji Pênûsa Jin**

## Civaka li xwe mukir neyê, ew nayê guhertin

**Nehîr Pale**

Li hemberî jinê bê adaletî û bê wijdaniyeke mezin tê kirin. Rojan e jin têne kuştin, tûndî li wan tê kirin, di temenê biçûk de dizewicînin, destdirêjî jinan dikin û direvîn in. Ji civakê jî kesek berpirsyartiya vê yekê ranake. Napirsin çima jin dikeve van rewşan de. Bi taybet jin bi rêbazên giran dawî li jiyana xwe tîn in.

Ev nebûye 4 roj li bajarê Hejînê yê Dêrazorê keçeke 20 salî xwe tavêjê çemê Firatê û hîna cenazeya wê nedîtine. Li Kobanê keçên ciwan dawî li jiyana xwe tînin, li Tebqa û Reqayê heman bûyer berdewam dike.

Dema jin dawî li jiyana xwe tînin, malbatên wan li xwe mukir nayên ku berê jinê dane kuştinê. Mîna malbata jina ji bajarê Hejînê. Ji civaka xwe re gotine ku bê hemdî keça wan ketiye çem û ber avê çuye. Lê derdorên wan dibêjin ku keça 20 salî xwe avêtiye ciyekî herî kûr da ku nefilitê û bimre.

Ev buyerên ku diqewimin encama cinsiyetparêziyê ye. Jin bi giştî dema dibihîzin jinekê dawî li jiyana xwe aniye dibêjin misoger ji ber zexta lê hatiye kirin berê wê daye mirinê. Ev pirsgirêk gelekî kevn e û berdewam dike, lê belê dîsa jî civaka zayendperest li xwe mukir nayê ku pirsgirêka jin heye. Li xwe mukir nayên ku rewşa jin tê de ye pirsgirêkeke civakî ya herî sereke ye, ji ber vê yekê li çareseriyê nagerin. Jin li gel wan ne girînge heya mirov dikare bêje nîv insan dibînin. Heyanî pêdiviya wan bi jinê heye û dikarin karê xwe bi jinê bikin, wê xwedî dikin, piştî ku di çavên wan nema bi kêrî tiştekî tê wê tavêjin. Mînaka vê yekê jî kevneşopiya ku mêr hevjîna xwe dike xwişka xwe. Ev yek di civaka zayendperest de rêbazekî ku rewabûnê bide hemû kiryarên mêr ên li ser jinê dide meşandin. Piştî ku mêr hevjîna xwe kir xwişka xwe êdî wê li ser bizewicê û nema xwedî lê derbikeve. Her wiha eger jin nema zarokan bîne mêr dibêje kargeh sekinî û dibe ez kargeheke nû vekim.

Tevgereke biçûk ji jinê li gel civakê pirsgirêke û bi exlaq, şeref û namûsê ve didin girêdan, lê belê hemû rêbazên dûrî wijdan û edaletê yên li hemberî jinê têne bikaranîn pirsgirêk nayên dîtin. Eger civaka zayendperest li xwe mukir neyê ew di zîhniyeta xwe de israr dike û xwe nade guhertin. Civaka cinsiyetparêz tu carî li xwe mukir nehatiye heyanî ku were guhertin. Di kîjan malbatê de jin dawî li jiyana xwe bîne, yan bireve, were kuştin an destdirêjî wê bikin vedişêrin û li ser digrin. Ji ber vê yekê li Kobanê, Dêra Zorê û hwd jin dawî li jiyana xwe tîn in. Ji ber zexta li ser wan, rêbazên li hemberî jinê didin bikar anîn dibe sedema ku girêdana wan bi jiyanê ve nemîne. Mirinê ji xwe re çareserî bibîn in.

Ev buyerên ku diqewimin dawî li wan nayê û em ê dîsa rojane bibhîz in. Eger zayendperestî pirsgirêk were dîtin wê demê wê pirsgirêka jin were çareser kirin.

# Bi awayekî balkêş jin beşdarî Mihrîcana Kurteçîrokên Kurdî dibe

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Jin bi pênûsa xwe Mihrîcana Kurteçîrokên Kurdî dewlemend dike, herwiha jinên beşdarî vê mihrîcanê bûne tekez kirin ku ev festîval gaveke girîng e ji bo pêşxistina pênûsa jinê û bi taybet wêjeya Kurdî.**

Her sal ji bo pêşxistina wêjeya Kurdî û pêşxistina pênûsa nivîskaran Mihrîcan Kurteçîrokên Kurdî tê li dar xistin, girîngiyeke vê festîvalê ya balkêş heye û her sal jî çîroknivîs bi awayekî xurt beşdarî mihrîcanê dibin. Di nava mihrîcanê de tevlîbûna pênûsa jinê zengîn dike û sal pey salê jî jin zêdetir beşdar dibin, îsal ji sedî 35 beşdarê wê jin in.

**Beşdarbûna jinê di Mihrîcana Kurteçîrokên Kurdî de**

Çîroknivîs Nisrîn Omer ku mamosteya zimanê kurdî ye û ji şêniyên Efrînê ye tekez kir ku lidarxistina Mihrîcana Kurteçîrokên Kurdî gaveke giring e ji bo pêşxistina pênûsa nivîskaran hem pêşxistina wêje û zimanê kurdî û wiha got: "Gelê kurd pir zilm û zor ji dagirkeran dîtin, dixwestin di rêya tunekirina zimanê kurdî gelê kurd qir bikin, ji ber ku ziman hebûn e wan jî hebûna gelê Kurd di tunekirina ziman de; tunebikin."

Nisrîn Omer cara yekemîn tevlî mihrîcanê dibe, kurteçîroka wê bi navê"Aşiqê Azadiyê" ye, kurteçîroka xwe li ser birayê xwe yê şehîd nivîsandiye û wiha dibêje: "Kurteçîroka min li ser lehengî, qehremanî û fedayîtiya şehîdan e ji bo rizgarkirina welatê xwe herwiha li ser jiyana birayê min e, çawa xwesteka wî hebû ku bibe şervanek ji bo bidestxistina jiyaneke azad û bi gelê xwe re jiyan bike. Min dixwest di rêya kurteçîrok û nivîsandinê di cîhanê de û bi gelê xwe re vê êşê parve bikim."



Nisrîn Omer



Lojîn Ibrahîm Hesen

**'Gihandina hêz û îradeya dayikên ku kurên wan di oxira welat de winda kirin'**

Lojîn Ibrahîm Hesen çîroknivîs û mamosteya zimanê kurdî ye ku cara duyemîn tevlî mihrîcana kurteçîrokên Kurdî dibe, wiha ji rojnameya me re axivî: "Çîroknivîsa min a îsal bi navê "Jiyaneke nû ye", li ser çîroka dayika şehîdekî diaxive ku li hêviya vegera wî ye. Piştre bi hêz û îradeyeke xurt jiyana xwe berdewam dike, da ku zarokê kurê xwe xwedî bike li ser nirxên hezkirin û parastina welatê xwe."

Lojîn Ibrahîm Hesen dibîne ku ev mihrîcan derfeteke guncav e ji bo her kesên ku bi nivîsandinê mijûl in û wiha anî ziman: "Em gelê kurd kêfxweşin ku em gihaştin demekê ku bi zimanê xwe binivîsîn in û bixwîn in, piştî salên tijî zilm û zordarî."



# Ji çiraxên wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Dilovan Tildarî Rewşenbîrê cengevanê di peyvê û helbestê de.

Wêjeya Kurdî di dema berê de û hîn jî yek ji pêkhateyên herî girîng ên nasnameya neteweyî ya Kurd e. Ji destpêka wê û heta îro, nivîskar û helbestvanên Kurd derbirîna xwe û civaka xwe kirine û him derbirîna serpêhatî, xewn, hêvî û êş wan kirine, bi van xebatên xwe yên wêjeyî, hişmendiya neteweyî ya Kurdan hate xurt kirin û têkiliya neteweyî ya gelê kurd hate pêkanîn.

Ji destpêka Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurd, di sedsala borî de, Nivîskar û Helbestvanên Kurd di belavkirina hişmendiya neteweyî û tekez kirina nasnameya kurdî û têkoşîna ji bo pêkanîna mafên gelê Kurd de roleke girîng lehîstine.



Helbestvanên Kurd hiştin ku gelê Kurd hîs bikin bi girîngiya parastina nasname, ziman, dîrok û çanda xwe û yekîtiya xwe ya neteweyî û statûya xwe neteweyî ya Kurdan xurt bikin. Helbestvan Dilovan Tildarî yek ji dengên helbestvanên Kurd ê diyare ku roleke girîng di parastina ziman û çanda kurdî de lehîstiye di rûyê pirsgirêkên siyasî û civakî de û di zindîkirina ruhê neteweyî yê gelê Kurd û rawestandina li dijî hewldanên pişaftina çand, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî.

Helbestvan Dilovan Tildarî di sala 1955'an de li gundê Tildarê ji dê û bavek Kurd (Mihemed - Henîfa), hatiye dunya yê, ew di malbatek neteweyî ya Kurdî de, ku aşiqê azadiyê mezin bûye. Wî dibistana seretayî li gundê În Dîwer û dibistana amadayî û lîse li bajarê Dêrikê xwendiye û Dûre ji bo xwendina xwe ya bilind biqedîne berê xwe da Zanîngeha Şama paytext, li wir kulîjeya Wêjeyî beşê Felsefeyê xwend, lê ji ber helwestên xwe yên siyasî yên wêrek û neteweyî û nîqaşkirina wî bi bijîşkan re li ser rewşa biyaniyên kurd ku ji hemwelatîbûna Sûrî bêpar mane nekaribû ku xwendina xwe ya zanîngehê biqedîne û ew jê hate dûrxistin, nemir Mihemed Elî yek ji qurbaniyên serjimêriya nerewa ku di sala 1962'an li parêzgeha Hesekê pêk hatibû û tê de bi sed hezaran Kurd ji hemwelatiya Sûriya yê bêpar man.

Hunera wî ya helbestî di temenek piçûk de, hîn şeş saliya temenê wî de derket holê, Şêwaza wî bi hêzbûn û rewanbêjiyê tête diyar kirin, bû sedema ku ew ji bo gelek helbestvanan bibe jêdera îlhamê, zimanê wî zindî bû, di wêneyan de dewlemend bû; Helbestên wî ne tenê gotinên bedewkirina rastiyê bûn û an jê pesindana xwezayê bûn, lê ew amûrek bû ji bo bihêzkirina berxwedanê û derbirîna êş û azaran di bin zexta dagirkerî û çewisandina çandî de. Ew diyar bû bi dengê xwe yê afirîner û beşdariyên xwe yên ji bo dewlemendkirina wêjeya kurdî bi riya helbest û stranên xwe karî bû ku nasnameya kurdî û Ruhê Neteweyî hevberî hev bike. Nebûna wî ne tenê tê wateya tunebûna kesekî, lê tê wateya tunebûna pînûsekî ku derbirîna pirsgirêk û derdên gelê xwe û çanda wê dikir, ku beşdarîya veguhastina wê dikir ji bo nifşên pêşerojê .

Ew zewicî bû û bavê heşt zarokan bû (sê xort û pênc keç)

Helbestên wî gelek babetan tînin ziman, mîna, Heskirin, welat, zordarî, mijarên ku derbirîna nebeza kolana Kurdî îfade dikin û di heman demê de rastiya civakî û siyasî nîşan didin.

Nemir Mihemed Elî helbestvanekî navdar û folklor e ji gundewarê Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye, ew yek ji kesayetiyên bi banor di çand, folklor û stranbêjiya kurdî de tê hesibandin, ji ber ku wî rolek berbiçav lehîstiye di parastina mîrateya çandî, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî bi riya helbest û stranên xwe,

wî şopên diyar hiştin di dîmena wêjeyî û çandî ya Kurd de, di riya karên xwe yên ku hesta neteweyî, wijdan û ruhê şoreşê bi hevre kirin yek ku çanda kurdî dewlemend kirin.

Ji helbestên wî yên herî navdar, ku bandorek kûr li ser dilê xwendevanan hiştin û hîn jî di guhên mirovan de dijenin:

1- Hewar û Gazî
2- Simtekarî
3-Xortên welat
4- Newroz
5-Serhildana 1991
6-Cegerxwîn.

Dilovan Tildarî naskirîbû bi helbestên xwe yên ku ruhê şoreşê diçîne, wî li ser pirsgirêkên rizgariya kurdî û mafên gelê kurd yê çarenûsî û redkirina zilm û neheqiyê nivîsandine, helbestên wî ji hêla germahî û kelecanê ve dihatin cudakirin.

Helbestên wî ji hêla kûrahî û dewlemendiya ziman ve têne diyar kirin, zimanê wî ji hêlekî ve hêsan e, lê ew gelek wateyan di hundir xwe de digire, hişte ku helbestên wî nêzîkî raya giştî û bijarteyan bi hevre bibe. Dilovan Tildarî pêguhdana wî ji Folklora Kurdî û strana resen re ji temenek piçûk ve dest pê kiriye, wî berdewam kir di vejandina wê di tevahî jiyana xwe de. wî yekem koma hunerî ya Folklora Kurdî li herêma Dêrikê bi navê "Koma Cûdî" ya Partiya Pêşverû damezrand, wî çavdêriya wê kir ji hêla hunerî û îdarî ve bi pêşkêşkirina stranan, dîlan û şanoyan ve .

Ew hîn ciwaniya xwe de tevlî refê Tevgera Neteweya Kurd bû û di sala 1968'an de beşdarî nav refên Partiya Pêşverû bû, ew di nav desteyên wê de bilind bû heta bû endamê herêmî yê partiyê li Dêrik û herêmên wê, ew bi rêgezên Demokrasiyê bawer bû û beşdarî vejîn û rêveberiya helkeftên neteweyî yên Kurdî bû, ew pir jêhatî bû ji hêla pêşkêşkirina helbestan û axaftinên xwe ve di cejnên Newrozan.

Helbestên wî ji hêla kûrahiya hestyarî û neteweyî ve cudabûn, piraniya helbestên wî veguhêrîn stranên nemirde, ku ji hêla hunermendên pabendî bi dozê ve hatine strandin û gotinên wî stranên ji bo azadî, rûmet û nasnameyê vedigotin.

Bi çûyina wî re, strana kurdî yek ji çavkaniyên nivîsên xwe yên resen ya tijî sembol û berxwedan winda dike, gelek helbestvan û hunermend bi karên wî, bandor bûn, di nav de birayê wî, yê helbestvan Lorî Tildarî, ku dest bi nivîsandina helbestê kir di sala 1979'an de, di bin bandoriya şêwaz û nivîsên wî de, herwiha gelek hunermendên Kurd jî gotin û awazên wî strandine mîna (Cemal Sadûn - Ronî Cezrawî Jazrawi, Azad feqe û hin hunermendên din ên Kurd) Ji stranên wî yên herî navdar ku ji hêla hunermendê nemir Cemal Sadûn ve hatîn gotin evin:

1- Wa Emîna Emîna
2- Sekna dilê mine
3-Emin xirtên di dilde mane
4- Çax borîn li me em têde man jar
5- Xwezî li we xortên mîjozan
6-Biyanim biyanim....

Hunermend Ronî Cezrawî jî gelek stranên wî gotine û ya herî navdar eve:

1-Xal xalê te dibînim te nabînim

Herwiha gelek hunermendên din çend stranên wî gotine mîna strana :

1-Rêbera min tuyî partî (partîzan)
2- Strana Şehîd Saîd Alçî
3-Karê me her berxwedane.
4- Ji bo jîna xweş û ciwanî.

Di kêliyekî bi êşek giran, helbestvan Dilovan Tildarî ji ser pişta peyvê hate xwar, ku li pişt xwe nivîsên ji Hesret, Heskirin û Berxwedanê hiştine, ew ne tenê helbestvanek bû li ser kaxezê dinivîsand, lê ew wijdanek bû ku ji birînên gelê xwe dibariya û dengek bû di şevek dirêj de ji bo azadiyê diqêriya, bi çûyîna wî re, çanda Kurdî yek ji zarokên xwe yên herî bi rûmet winda kir, ku ji tevan dilsoztir bû di derbirîna êş û hêviyên wê de .

Dilovan ne helbestek derbasbûyî nivîsandiye, lê ew herikiye li her malê û di her helbestê de, gotinên wî mîna simbilên genim yên ku li ser erdeka zuha şînbûne û di dilê her kesê ku ew bihîstin e dimîne, ew ne tenê bes ji bo ziman dijiya, lê belê helbestên wî parêzvanê bîrdanka welatek parçebûyî û winda bû, lê ew hîn jî şer dike ji bo welatek azad.

Helbestên wî veguhêrîn stranên ku tucarî nemirin, ji hêla mezin û piçûkan ve tê vegotin û hunermendan ew stirandin û gotinên wî kirin sîrûdeka gelêrî mîna strana (Rêbera min tuyî partî), peyvên wî ji bo berxwedanê dijeniyan, xemgîniya Kurdan bi awazekî bedew vedûhûne û hêstran vediguhêze hêviyek hêzdar.

Bi çûyîna wî, yek ji çavkaniyên herî girîng ên îlhama ji bo strana Kurdî ya pabend wenda bû. Helbestvan Dilovan Tildarî ji prensîbên partiya xwe re dilsoz û pabend maye heya ku ew di roja 8'ê Pûşbera 2011'an di encama kirîza dil de jiyana xwe ji dest da, laşê wî, bi merasîmek bi heybet ji xelkên herêma Dêrikê ji partiyên kurdan, rewşenbîrên kurd û kesayetiyên civakî sipartin xakê li gundê wî Tildarê .Gelê Dêrikê di gelek çalakî û helkeftinan de bîranîna wî vejandine û bi helwesta xwe tekez dikin cihê wî yê bilind wekî helbestvan û têkoşerekî ji bo doza kurdî .

Piştî mirina wî, ew ji hêla civaka kurd ve hate xelatkirin, gelek qursên perwerdehiyê yên zimanê kurdî bi navê wî hatin navkirin, wek dewra "Dilovan Tildarî " ku li Dêrikê di sala 2014'an de hate pêkanîn, wek sipasnameyekî ji bo karên wî di parastina ziman û çanda kurdî de. Bi çûyîna wî, welat sembolek mezin di wêje, şehrezayî û helbestê de winda kir.

"Helbestvan Dilovan" li pişt xwe xezîneyên wêje û helbestê hiştin, Ku dê jiyannameya wî vebêjin û bîranîna wî sermedî bihêlin di rûpelên welat de.

Wî li pişt xwe mîrateyek wêjeyî û çandî ya dewlemend hişte, mîrateya wî tenê bi hêjmara dîwanan an jê hêjmara helbestan nayê pîvandin, lê biqasî hebûna wî di bîrdanka çandî de û bandora wî di wijdana giştî de tê hesibandin, nebûna wî valahiyek hişt, lê wî pirin ber bi pêşerojê ve hiştin, ku nifşên pêşerojê dikarin sere derbas bibin ku peyv û xewnên wî hilgirin.

Bi çûyîna Dilovan re, gelê Kurd ji helbestvanek zêdetir, winda kir, wî bîrdank wendakirin, wî neynika xwe ya dema berzebûn de winda kir, wî pira duh ya wêranker ku bi sibeha avaker ve girêdide winda kir, Lê mîrasa wî dimîne, helbestên wî dê berdewam bikin ku nifşên pêşerojê jê fêr bibin ku peyva azad nayê mirandin û ew helbest dikare bibe welatek ji bo kesên ku bê welat bin.

Divê çûyîna wî ne dawî be, lê divê bibe destpêkirina tevgera hişmendiyek nû ji bo belgekirina xebat û karên wî, û berhevkirina helbestên wî, da ku wan li dibistanan bidin xwendin û stranên wî di hemû çalakiyên wêjeyî de werin gotin, ji ber ku Dilovan ne ji bo xwe di nivîsand, lê wî ji bo me hemûyan dinivîsandin. Rihet çavên xwe deyne ser hev, çûyîna te nebûna laşe û mayendeya helbestê ye, tu azad bû û bi diwêta nebezê dinivîsî, û nifşên pêşerojê wê rêça ku te bi peyvan xemilandibû bibin serî, ew ê li her deverê helbestê bikine çek û hilgirin mîna ku te hilgirtî, ew ê navê te bibêjin li her dera ku ji bo welat bistirînin . Ji bo rewanê te yê pak rûmet û mandarî Ji bo mîrateya te ya têkoşînî, wêjeyî û çandî mayende û domdarî.

# ‘Çareserkirina pirsgirêka koçberan bingeha çareserkirina pirsgirêka Sûriyê ye’

**Berpirsê Têkiliyên Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso destnîşan kir ku çareserkirina pirsgirêka koçberan bingeha çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê ye û got, “Divê dagirkerî ji herêmên dagirkirî were derxistin û sûcdarên şer bên cezakirin."**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**



Ji sala 2018’an ve dema dagirkirina Efrînê ve, paşê dagikirina Serêkaniyê û Girê Spî di 2019’an de, dagirkerî li ser van herêman tê domandin. Piştî rûxandina rêjîma Baasê hêviya şîneyên resen yên ku di kampan de û deverên Rêveberiya Xweser û derveyî welat dijîn, ew bû ku rasterast vegerin warê xwe, lê dagirkerî di roja îro de dibe astengiyeke mezin li pêşiya hêviya wan. Derbarê dewamkirina dagirkeriyê û vegera koçberan li bajar û gundên dagirkirî yên di bin kontrola dagirkeriya Tirk de û çeteyên girêdayî wê de, Berpirsê Têkiliyên Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso ji rojnameya me re axivî.

**‘Tevî sozên desthilata Şamê, dosiyaya vegera koçberan nehatiye guhertin’**

Ciwan Îso da zanîn ku tevî sozên desthilata Şamê, hîna dosiyaya vegera koçberên Serêkanî, Efrîn û Girê Spî çareser nebûye û wiha got: “Piştî ketina rêjîma Baasê, Sûriyê derbasî qonaxeke nû bû, divabû di vê qonaxê de sîstema dewletê, siyaseta wê hem jî cewherê wê bi temamî bihata guhertin, ji wan mijaran jî mijara koçber û penaberan. Wekî tê zanîn Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî di bin sîwana dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de ye, ev yek jî bi siyaseta dewleta Tirk de ye. Tevî ku rêjîm jî ket, mixabin hîna jî tiştek nehatiye guhertin û hîna dosiyaya deverên dagirkirî weke berê ye. Dosiyaya koçberiyê mijareke qanûnî û exlaqî ye, ev deverên dagirkirî jî divê werin valakirin ji çete û dagirkeriyê. Lê tevî ku desthilata Şamê soza vegera koçberan da û got rewş li herêmên dagirî weke Serêkaniyê û Efrîn û hwd… aram e, lê hîna komên çete binpêkirinan li ser xelkê resen didomînin, hem jî siyaseta berê ya dewleta Tirk tê berdewamkirin.”

**‘Çareserkirina pirsgirêka Sûriyê, bi çareserkirina mijara vegera koçberan ve ye’**

Îso derstnîşan kir ku çareserkirina pirsgirêka koçberan û herêmên dagirkirî bingehê çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê ye û wiha domand: “Piştî ewqas salên dagirtî êriş, şer, binpêkirin, koçkirin û talankirinê divê hemû alî ji bo dosiyaya koçberan kar bike. Divabe sûcdar bên cezakirin, hem jî koçberên ku zerer dîtin bên qerebokirin û mafê koçberan bê dayîn, weke mafê xwendinê, em dizanin ku bi hezaran kes di kampan de bi zehmetî jiyan dikin, di nav wan de jin û zarok rastî astengiyan tên, xwendekar zehmetiyan di warê perwerdeyê de dibînin. Bi têkçûna rêjîmê re divê êdî hemû pirsgirêk bên çareserkirin, pirsgirêka koçberên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî jî pirsgirêkeke bingehîn e, heta ev pirsgirêk çareser nebe, koçber venegerin warê xwe, pirsgirêka Sûriyê çareser nabe. Dem dema ku Sûriyê were avakirin ku bikaribe her kes tê de bi aramî jiyan bike, koçber jî dixwazin vegera wan ewle be û ew herêmên xwe bi rê ve bibin herwiha MSD, QSD û Rêveberiya Xweser hemû hewldanên xwe dikin ku ev yek pêk were. Vegera koçberan, hem jî destpêkirina jiyaneke nû ji bo wan divê bi navbênkariya sazî û rêxistinên mirovî Neteweyên Yekbûyî pêkwere.”

**‘Divê dagirkerî ji herêmên dagirkirî derkeve’**

Berpirsê Têkiliyên Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso tekez kir ku divê dagirkerî ji herêmên dagirkirî werin derxistin û sûcdarên şer bên cezakirin û wiha bi dawî kir: “Herêmên dagirkirî weke Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê bi tevahî di bin sîwana dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê de ne, ev dever ji axa Sûriyê parçekirî ne. Ji bo vegera wan jî divê hin xal bên çareserkirin, di serî de divê dagirkerî ji herêmên dagirkirî vekişe, hem jî komên çete û dagirkeriya Tirk li ser komkujiyên ku derheqê şêneyên resen ên wan herêman de kirin, bên cezakirin. Di heman demê de peymana 10’ê Adarê ya ku di navbera rêveberê Giştî yê QSD’ê û Ehmed Elşerii de hat îmzekirin, bê pêkanîn ji bo koçberan, tevî îmzekirina vê hevpeymanê hîna di warê pratîkî de tu gav nehatine avêtin, sedem jî siyaseta dewleta Tirk û berjwendiyên wê ne. Li aliyekî din jî divê koçber hemû vegerin warê xwe bi vegereke ewle. Em bi navê Desteya Koçberên Serêkaniyê bang li hemû aliyan dikin ku bi erkê xwe rabin li hemberî dosiyaya koçberan, ji ber ku mijareke exlaqî ye û çareserkirina wê dikeve ser milê hemû aliyên ku dixwazin welatekî azad û aram ava bibe.”

# 17’ê Pûşperê Roja Cîhanî ya Têkoşîna Li Dijî Çolbûyîn û Zuhabûnê

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Cîhan rûbirûyê metirsiya çolbûyîn û zuhabûnê ye, lewra ji bo ku cîhan bi vê metirsiyê agahdar be, di sala 1994’an de, Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî 17’ê Pûşperê wekî Roja Cîhanî ya Têkoşîna li dijî Çolbûyîn û Zuhabûnê ragihand. Lê kiryarên mirovan ên domdar û neparastina wan ji jîngehê re, rêjeya asta çolbûn û zuhabûnê zêde dike.**

Cîhan ji aliyê felaketên xwezayî yên lezgîn ve tê tehdîdkirin. Çolbûn yek ji wan pirsgirêkan e ku tevahiya cîhanê pê re rû bi rû ye û ji bo kêmkirin an rawestandina bandorên wê, çalakiyên lezgîn û hevgirtî hewce dike.

Di sala 1994’an de, Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî 17’ê Hezîranê wekî Roja Cîhanî ya Têkoşîna li dijî Çolbûyîn û Zuhabûnê (Hişkesaliyê) ragihand, da ku balê bikşîne li ser pirsgirêka çolbûn û hişkesaliyê. Ev roj wekî hişyarî li ser xetereyên heyî û pêwîstiya têkoşîna li dijî wê ye. Çolbûn ji ber gelek faktoran çêdibe, di nav de guherîna avhewayê û çalakiyên mirovan ên wekî çandiniya zêde an jî birîna darên daristanan.

Çolbûn pirsgirêkek cîhanî ye ku bandorên wê yên cidî li ser biyolojîk, aramiya civakî û aborî li seranserê cîhanê hene. Zeviyên hişk jixwe nazik in, û dema ku ew xirab dibin, bandora wan li ser mirovan, ajalan û jîngehê dibe.

**Sedemên çolbûnê**

Sedema pêşketina biyabanan xerabûna berdewam a ekosîstemên erdên hişk ji ber çalakiyên mirovan e, di nav de çandiniya nedomdar, zêde çêrandin, birîna daran û guherîna avhewayê. Herwiha dema ku çolbûn çêdibe, dar û nebatên ku bi axê ve girêdayî ne têne rakirin.

**Hin cûreyên çolbûnê**

Cûreyên çolbûna erdê ev in: Çolbûna ji ber ba, av, şorbûna axê û hwd… Li gorî van cûreyên cûda, çolbûna erdê bi şiklê xirabûna erdên çandiniyê û daristanan çêdibe.

**Cudahiya di navbera çolbûn û çolkirinê de**

Ji ber germahî û hişkbûna zêde, çol bi hebûna hin giyayên çolê yên ji koma xerofîtan (Nebatat cafe) û heywanên ku li hember germê ne, tê xuyanîkirin. Çolbûn, di forma xwe ya herî hêsan de, windabûna nebatan li deverên ku berê hatine çandin, wek mînak birîna daristanan ji ber sedemên cûrbecûr, wek agirên ji ber mirovan an kîmyaya axê.

**Cûdahiya di navbera ziwabûn û çolbûnê de**

Çolbûn wekî hilweşîna erdê li deverên hişk, nîv-hişk, hişk û bin-şil ji ber gelek faktoran, di nav de guherîna avhewayê û çalakiyên mirovan, tê pênasekirin. Ev hilweşîn bandorê li potansiyela hilberîner, aborî û biyolojîkî ya van axan dike. Li seranserê cîhanê, salane 12 milyon hektar erd tê hilweşandin.

**Qonaxên çolbûnê**

1- Çolbûna seretayî ya sivik: Ew bi xuyakirina nîşanên xirabûna jîngehê ya herêmî dest pê dike ku bi guherînek hejmarî û kalîteyî ya paşverû di pêkhateyên pêça nebatan û axê de tê temsîlkirin.

2- Çolbûna nerm: Ew qonaxek nerm a xirabûna jîngehê temsîl dike ku tê de dikare were gotin ku kêmasiyek di hilberîna nebatan de heye ku digihîje bi qasî ji sedî 25 ji enerjiya Erdê. Ev qonaxek krîtîk e ji ber ku derengxistina wê dibe sedema xirabûna bêtir.

**Rêjeya çolbûnê li cîhanê**

Tê texmînkirin ku bi qasî %10-20 erdên hişk jixwe xirab bûne, tevahiya rûbera ku ji çolbûnê bandor bûye di navbera 6 û 12 milyon kîlometreçargoşe de ye, bi qasî %1-6 nifûsa erdên hişk li deverên ku ji çolbûnê dikişînin dijîn û milyarek kes ji ber çolbûna bêtir di bin gefê de ne.

**Hin ji rêbazên ji bo rawestandina çolbûnê û şerê li dijî hişkesaliyê ew jî wiha ne:**

- Çandiniya domdar.
- Parastina axê.
- Vegerandina ekosîstemên ava şirîn.
- Nûjenkirina deverên berav û deryayî.
- Vegerandina xwezayê ji bo bajaran.

**Rîskên çolbûn û hişkesaliyê**

Windabûna Cûrbecûriya Biyolojîk: Çolbûn dibe sedema kêmbûna cûrbecûriya biyolojîk û kêmbûna nebat û ajalan.

Xerabûna Çavkaniyên Avê: Çolbûn dibe sedema kêmbûna ava binê erdê û zuwabûna bîr û kaniyan, bandorek neyînî li ser nifûsa ku bi van çavkaniyan ve girêdayî ye dike.

**Bandora çolbûnê li ser jiyana mirovan**

Bandorên çolbûnê di guhertinên di nebatan de diyar in, ji ber ku nebatên dagirker cihê nebatên xwecihî digirin, bandorê li ajalên çêrandinê dikin û jiyana çêrgehan ji bo xwedîderketina jiyana kovî qels dikin.



Çolbûn herwiha dibe sedema kêmbûna ava binê erdê û zêdebûna bahozên tozê ku bandorek neyînî li ser tenduristiya mirovan dike.

**Rêbazên têkoşîna li dijî çolbûnê**

Rawestandina birîna daran, şewitandina daristanan û paqijkirina erdên çandiniyê. Rawestandina zêdeçêrandinê û rêxistina cihên çêrandinê. Rêxistina rêveberî û lênêrîna axê. Destpêkirina kampanyayên hişyarkirinê ji bo nifûsê li ser çolbûn, parastina axê, rêveberiya erdên çandiniyê, dabînkirin û parastina çavkaniyên avê.

**Diyardeya hişkesaliyê ya li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê;**

Zuhabûna çeman; Asta ava çemên Firat, Xabûr û bendavên herêmê ji ber birîna avê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve, kêm bûye.Herwiha ji ber guhertina avhewayê û polîtîkayên qutkirina avê, ji sêyan yekê rûbera herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rû bi rûyî zuhabûn û karesatên xwezayî ye.

**Gefa çolbûyînê li ser Sûriyê heye**

Hewayê Sûriyê bi giştî nîvzuha ye. Li gorî lêkolînan, ji rûbera Sûriyê ku 187 hezar kîlometreçargoşe ye, zêdetirî nîvê wê di bin gafa çolbûyînê de ye. Di heman demê de li gorî lêkolînan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nêzî 15 hezar hektar erd bûye çol û ji sedî nêzî 85 hektar di bin gefa çolbûyînê de ye. Herwiha sal bi sal rêjeya qada çolbûyînê li herêmê li gorî salên beriya xwe zêde dibe. Sedemên vê zêdebûnê jî ew e ku li ser pirsgirêkên jîngehê nayên kontirolkirin û rê li hemberî vê yekê nayê girtin.

Li gorî lêkolînan, li kantona Dêra Zor, Reqa, Tebqa û bajarê Hesekê çolbûyîn bêtir e. Ev çolbûyîn jî êdî deverên bakur û navîn jî dide ber xwe.

**Sedemên çolbûyînê**

Guhertina avhewayê, zêdebûna pêlên zuhabûnê, zêdebûna şorbûn, herwiha belavbûna qûmê li ser qadên çandiniyê.

**Mirov jî dibin sedemên çolbûyînê**


Kiryarên bêplan ên ku pergala jîngehê û taybetmendiyên axê di ber çavan nagirin, çêrandina zêde ya bêserûber, kolandina erdên çandniyê, birîna daran û jiholêrakirina daristanan, bandorên şer û operasyonên leşkerî ên li Sûriyê, herwiha qutkirina ava çeman, sedemên zêdebûna diyardeya çolbûyînê ye.



# ‘Ger Îran di hevdîtinan de bi ser nekeve wê şer berdewam be’

**Rojnamevan Kakşar Oremar diyar kir ku ger Îran di hevdîtinan de bi ser nekeve wê şer berdewam be û wê DYA’yê jî li dijî wan dest bi şer bike û wiha got: “Ketina DYA di nava şerê Îsraylî û Îranê de, wê bibe sedema bêhêziya siyasî, leşkerî û aborî ya Îranê."**

**Birûc Resûl/Qamişlo**





Şerê rasterast yê Îsraîl û Îranê bê navber dewam dike, ev şer ji 13’ê Hezîranê bi êrîşa Îsraîlê ya li ser Îranê destpê kir. Di vê çarçoveyê de Rojnamevan Kakşar Oremar bersiva pirsên Rojnameye me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di 13`ê Pûşpera 2025’an artêşa Îsraîlê li ser Îranê êrîşeke esmanî dest pê kir û gelek fermandarên subay pasdaran hatin kuştin. Hûn êrîşên Îsraîlê yên li ser axa Îranê çawa dinirxînin?**

Di hemû temenê komara îslamî de, dewleta Îranê biqasî roja îro rastî êrişên wiha giran nehatibû. Dewleta Îsrayîl êrişên wiha weke serokkomarê wan daye diyarkirin ji bo “xweparastin û mayîna xwe” dike. Êdî pêvajoyeke nû bi vî şerê han re li Rojhilata Navîn hatiye holê ku ji 7’ê Cotmeha sala 2024`an heya niha xwedî şerên giran di navbera aliyan de bû ye. Ji navê wê êrişê ku dewleta Îsrayîlê weke” Rabûna Şêr” bi nav kiriye wisa tê xûyanê ku ev êriş yê heya demek an jî çend rojên din berdewam bin. Rûniştandina 6’an ya hevdîtinên di navbera aliyê Îranî û Amerîkayî de hate betalkirin û êdî pêre yê rewşeke nû çêbibe. Bendewarî ew bû ku bi berdewamiya van hevdîtinan ew ê bigehin encama dawiyê, lê Îranê, ji bo sûdgirtina ji derfetan hin caran ew hevdîtin betal kirin. Hincet jî ew e ku dibêjin em di rewşa şer de ne û hevdîtin bi dewletekê re jî ku hevkariya dijminê me dike, bê wate ye.

Îran di rewşeke pir metrsîdar de derbas dibe û niha tenê du rê li ber rejîma îslamî ya Îarnê mane:

1-Di hevdîtinan de hemû şert û mercên Amerîka bipejirîne û bitaybetî jî dest ji hilbirîna Uranyomê berde.

2-Wan mercan nepejirîne û êdî bi şerê ku Îsrayîlê li dijî wan daye destpêkirin sîstema wan a desthilatdariyê bi yekcarî biherife û dewleteke nû bê ser kar.

Ji 13`ê Hizêranê û şûn ve esmanê Îranê di kontrola Israyîlê de ye û ji tirsa hêza êstixbaratî ji sedî 90 ji fermandarên xwe yên leşkerî veşartine. Îran wê nikarîbe şerekî wiha li dijî Îsrayîl û hevalbendê wê yê sereke angu DYA berdewam bike. Ji ber ku hemû jêrxanên wê yên rokêtan û hilbirînê bûne armanca bombaranên artêşa Îsrayîlê. Xûya bû ku rayedarên Îranî û di serî de jî Ayetulah Xaminêyî yê rojekê ku ez bi :”xwekujiya leşkerî-siyasî” pênase dikim.

Di hemû warên: Hêza fezeyî û hewayî, Budceya Parastinê, hêza teknîkî û êstixbaratî, hejmara balefer û çekên din yên şer Îsrayîl ji Îranê bihêztire. Ji ber wê jî em dibînin ku ji roja duyem û şûn de wezîrê derve yê Îranê daxwaza navbeynkariyê ji hinek welatan dike, lê Îsrayîl dide xûyanîkirin ku wê bi awayî herî giran êrişên xwe berdewam bike.

**Dê ev êrîş çawa bandora xwe li ser Rojhilatê Kurdistanê û hêzên Tevgera Azadiyê bikin?**

Pisra sereke ku piraniya Kurdan ji xwe dikin ev e: “Ger partiyên Rojhilatê Kurdistanê di rewşeke wiha de li dora hev kom nebin û karekî nekin, yê kengî bikin?”

Di nava sinorên siyasî yên Îranê de Kurd hêza yekê a dijberî sîstema desthilatdar bûne û ji 1978`an û şûnde herî zêde bedelên giran ji bo destbeber kirina, daxwazên xwe yên siyasî pêşkêş kirine. Herî dawiyê Kurda li Îranê bi şoreşa “Jin-Jiyan-Azadî” re tirseke mezin li Tehranê çêkirin û dîsa daxwazên xwe yên dîrokî raxistin ber çavan. Di vê rewşê de pêwîst e partiyên sereke: PDK. Îran, Komele, PJAK û rêxistinên din li dora hev kom û bi avakirina odeyeke fikrî stratejiya xwe ye pêwîst li gor daxwazên demê eşkere bikin. Partiyên siyasî li Rojhilatê Kurdistanê xwe bandoreke siyasî-fikrî a mezin di nava Kurdan de ne, dîsa dikarin ji bo pêşerojê û avakirina statûyekê bi şêweya Rojava û Başûrê Kurdistanê ji niha da hêzeke leşkerî a hevgirtî ava bikin, divê hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistan dest bi diyalog, hemahengî, yekrêzî û amadekirina plan, proje û bernameyên hevbeş bikin.

Ji bîr nekin ku çûyîna her dîktatorekê yê di berjewendiya Kurdan de be. Bi çûyîna Sedam Husên û Beşar Esed me ev rastî dîtin. Herwiha divê di vê rewşê de Hikûmeta Herêma Kurdistanê (PDK û YNK) êdî bi awayê salên berê piştgîriyên dîplomatîk-aborî nedin rejîmeke bêmeşrûyet û xwedî împeratoriya xwînê li hemû cihanê.

**Wê nêzîkatiyên dewletên cîranê Îranê çawa bin û bersiva Îranê ya pêşerojê wê çi be?**

Bi despêkirina şerekî wiha re sê senaryo têne xûyanêkirin:

1-Ger Îran di hevdîtinan de bi ser nekeve yê şer berdewam be. Êdî neçar Amerîka jî yê li dijî wan dest bi şer bike. Yanî ketina nava şer ya Amerîka yê bibe sedema hemû bêhêziyên siyasî-leşkerî û aborî li Îranê.

2-Dibe ku Îran di vê reweşê de êrişî welatên kendavê bike. Meram jî ew e ku di warê aborî de nehêle hatin-çûyîna petrol û keresteyên din bi rêya wan welatan berdewam be. Yanî ev yêk yê bibe sedema kirîzeke aborî li hemû cihanê û bilindbûna bihayê petrol û hemû pêwîstiyên din yên jiyanê. Ji 13`ê Hizêranê ve heya niha 14 ji sedî qîmeta petrolê girantir bûye.

3-Encama şerekî wiha dikare dawiyê li temenê komara îslamî a Îranê bîne. Bi pêşhateke wiha re êdî derfetên mezin yê li ber gelên weke Kurd û Belûç vebibin û hêza demokrasîxwaziyê yê li herêmê zêdetir bibe. Ev yek yê bibe sedema gûhrandinên bingehîn û xwedî bandor li dijî dewletên îslamî û desthilatê bi rêbazên îslama siyasî, Kurd dikarin sûdê herî mezin ji vê rewşê werbigirin, di heman demê de Rojhilatê Kurdistanê dikare bibe statûya sêyem li ser axa Kurdistana mezin.

Êriş heya niha ne tenê bi beşên bernameya nuklerî ya Îranê ve sînordar bûn, lê di heman demê de parastina hewayî ya welatê Îranê jî bûye hedefa êrişên Îsrayîlê. Ev yek nîşan dide ku Îsraîl di rojên pêş de ji bo êrîşên din amadekariyan dike.

Têkiliyên Îran-Îsraîlê ji sala 1978`an û pêde sal bi sal xerab û xerabtir bûne. Bi dehan sal e di navbera her du dewletan de şerê cemidî berdewame. Her du alî êrişî berjewendiyên hev dikin, bêyî ku rasterast berpirsiyariyê bigirin ser xwe, lê ji dema ku şerê Xezayê dest pê kir, êrişên di navbera Îran û Îsraîlê de zêdetir bû. Îsraîlê di Îlona sala derbasbûyî de serokê Hizbullahê kuşt û di destpêka vê salê de serokê Hamasê jî kuşt. Her du kom wekî alîkarên herî nêzîk yên Îranê li herêmê têne hesibandin.

Berdevkên Îsraîlê bi berdewamî gotin ku “Îran gefên giran li dijî hebûna me dike”, her wiha rêberê herî payebilind ê Îranê, Ayetullah Elî Xameneyî, ji bo danasîna Îsraîlê gotinên wekî “tumireke penceşêrê” bi kar tîne. Di vê derbarê de Xûmeynî jî weke damezrînerê hikûmeta Îslamî li Îranê xwedî gotin û peyamên wiha ye.

Îsraîl ditirse ji hilbirîna “çekên nuklerî” û dibêje ku operasyona heyî bi armanca tinekirina “Binesaziya leşkerî ya Îranê tevî tesîsên wê yên nuklerî” hemû hewledanên xwe dide.

**Ev şer wê çawa bandora xwe li ser pêvajoya Aştiyê ku li Tirkiye dest pê kiriye, bike?**

Vê rewşê tirseke mezin di dilê rayedarên dewleta Tirk de jî çêkiriye. Ji ber ku di warê leşkerî û siyasî de dijberiya her du aliyan li hemberî hêzên demokrasîxwaz û di serî de jî rêxistinên Kurdistanê de heye, her du dewlet li dijî doza Kurd û girtîgehên wan tije azadîxwazên Kurd in. Perça herî mezin a Kurdistanê di bin desthilata Tirkiyê de ye, bi vê rewşê re ger lezê nedene rêbazên çareseriyê, hingî Kurd yê li herêmê bihêztir bibin. Hemû senaryoên ku di serê Erdogan û Baxçelî da bûn vala derketin û wan nekarî statûya Rojava ji holê rakin û di qada siyasî de jî îro hemû topên Kurdan di erdê wan de ne.

Bêgoman Tirkiye yê gelek hewledanên xwe bide ku nakokiyên di navbera Kurd û Azeriyan li Îranê zêde bike, lê bawer nakim bi ser bikeve. Sedem jî ew e ku Azerî piranî alîgirên sîstema desthiltdar li Tehranê ne û di hakimiyetê de jî xwedî hêzeke mezinin, lê Kurd li dijî navendgerayê ne û daxwza mafên xwe yên netweî-siyasî dikin. Asta rewşenbîrî a siyasî di nava Kurdan de bilind û tirseke mezin ji partiyên siyasî li Rojhilatê Kurdistanê jî di dilê dijberên wan de heye. Êdîy a din dimîne li ser awayê kar û pêşamadekariyên partî, sazî û rêxistinên din yên siyasî li Rojhilatê Kurdistanê. Ji bîr nekin ku van rojan ew tirsa ku di dil û mejiyê rêberên Îranê de heye zêdetir ji wê jî di dil û serê rêberên komara Tirkiyê de ye. Yên ku ji van gûhertin û şerê di navbera Îsrayîl û Îranê de, dikarin sûdê bistînin aliyê Kurdan, lê ka yê çiqas dûrbîn û xwedî wê feraseta siyasî û dîplomatîk bin ku bikaribin ji derfetên heyî feydê bistînin.

# Aldar Xelîl: Biryarên Kongreya PKK'ê nîşaneya dûrdîtinek stratejîk e

Endamê Desteya Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl diyar kir ku biryarên di Kongreya PKK'ê ya 12'an de hatin girtin nîşaneya dûrdîtineke stratejîk û kûr e ku dawîkirina pêvajoyekê û destpêkirina pêvajoyekî nû ye.

**Amara Baran/Qamişlo**

Endama desteya Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl li ser girîngiya Kongreya PKK'ê û bandora wê li ser pêşeroja Sûriyê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:



**- Herî dawî PKK'ê biryarên kongreyê eşkere kir, di van biryaran de hate destnîşankirin ku ji bo pêvajo bi pêş ve biçe divê şert û mercên xebata azad a Rêber Apo were peydakirin û di wateyeke berfireh de rêgezên qanûnî bên çêkirin. Hûn van biryaran çawa şîrove dikin?**

Di navbera 5-7 Gulanê de PKK'ê kongreyekî dîrokî li dar xist û biryarên ku hatin girtin nîşaneya durdîtineke stratejîk û kûre ku bi dawîkirina pêvajoyekê û destpêkirina pevajoyeke nû ye. Ew jî tê wateya ku di paradîgma nû de tevgerek nû, şêwazekî nû a tekoşînê lazime bê kirin. Xebatek dîrokî dayîna meşandin tiştekî stratejîke. Ji ber wê jî rêberê paradîgmaya nû a" Aşitî û Civaka Demokratîk" Rêber Apo bi xwe vê pêvajoyê bi rêve bibe, yê ku Tevgera Azadiya Kurdistanê ava kir û bi rêve bir Rêber Apo ye, ger Rêber Apo nebe Tevgera Azadiyê wê nikaribe gavên dîrokî bavêje.

Pêwîst e şert û mercên azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk werin ku bikaribe pêşengtiyê ji pêvajoyê re bike. Ev 27 sal in ku dewleta Tirk Rêber Apo di gireva Îmraliyê de wek rehîne girtiye. Komara Tirkiyê ji damezrandina xwe ve xwest ku bi hebûna Tirkan tunebûna Kurdan pêk bîne, ji ber wî jî bi israr xwestin ku her carê cezayên girtîgehê li Rêber Apo giran bikin. Paradîgma wan li ser esasê hebûna Tirka û tunebûna kurdan e.

Dewleta Tirk pêwîst e êdî qebûl bike ku bi destpêkirina pardîgmaya nû a ku Rêber Apo û Tevgera Azadiyê daye destpêkirin, nema dikare bi pradîgma kevin bimeşe, pêwîst e paradîgma xwe biguhere çawa ku Rêber Apo û PKK'ê paradîgma xwe diguherin ji paradîgma dewlet netew derbasî paradîgma civaka demokratîk dibin. Paradîgma ku xwe dispêre şer û pevçûnan û nakokiyên proleterya û çînî yên bi sîstemê re niha derbasê şêwazek nû a tekoşînê dibe, xwe naspêre proleterya xwe dispêre komînan, yanî nakokiya navbera komînv û dewletan de, ew jî guhertinekî cîdî ya pradîgmayê ye.

**- Dewleta Tirk Ji bo ku qebûl bike ku hebûna dewleta Tirk giredayî hebûna gelê Kurd e, çi lazime bê kirin?**

Heta ku dewleta Tirk xwe neguhere pêvajo nayê meşandin. Dewleta Tirk lazim e xwe îkna bike ku hebûna dewleta Tirk bi hebûna gelê Kurd, gelê Ereb û gelên ku li heremê dijîn ve girêdayî ye, bi taybet Kurd û Tirk, bi hebûna herdû aliyan jî bi hevdû ve girêdayî ye. Ger dewleta Tirk wê bike lazim e Rêber Apo li girtîgehê nemîne û azadiya xwe ya fîzîkî bidest bixe. Lê heta niha jî mafê hêviyê nehatiya dayîn ku Rêber Apo bi awayekî azad kar û xebatê bide meşandin. Tevgera Azadiyê jî dibêje pêwîst e şert û mercên ku Rêber Apo bi awayekî azad xebatê bimeşîne, ne tenê ji bo kar û xebata xwe dibêjin, bê gûman ew faktoreke serekeye. Dewleta Tirk jî xwe nîşan bide û bêje ku ez jî xwe diguherim û bigîhije wê qenaetê ku hebûna Tirkan ne bi tênekirina Kurdan ve girêdayî ye, pradîgma xwe biguherin û hebûna gelê Kurd û civaka demokratîk qebûl bikin, ew jî rengê xwe bi azadiya fîzîkî a Rêber Apo bide diyarkirin. Pêwîst e gavên fermî û zagonî bên avêtin. Ji bo hemû gelan, girtiyan û ji bo demokrasiyê girîng e ku çawa PKK'ê gavek girîng avêt û di raya giştî de îlan kir ku nema bi şêwazê şerê çekdarî tekoşînê dike, gerek dewlet jî bêje ku ez jî gavekî girîng davêjim ji aliye yasayî û zagonî ve.

**- Serokkomarê Tirkiyê Erdogan di her nirxandinê xwe de behsa "Tirkiya bê teror û çek teslîmkirinê dike" di biryarên Kongreya PKK de jî tê gotin ku şerê çekdarî hatiye rawestandin, lê hê çek nehatine danîn. Hûn wê nêzîkatiya dewletê çawa dinirxînin?**

Pêvajoya ku hatiye destpêkirin a ji nûve avakirina komara Tirkiyê ye, pêkanîna mafê gele kurd û hemû gelê li Tirkiyê û Kurdistanê jiyan dikin. Ji nûve avakirina civaka demokratîk û derxistina Tirkiyê ji qirîz û aloziya ne. Rêgirtina tiştên muhtemel ku Tirkiye bikevê û pirsgirêkên ku Tirkiye pêre rû bir û dimîne, ev pevajo ji bo Tirkiyê derfetekiye. Pênaseya Tirkiya bê teror bi armanca pêvajoyê re bi nakok e, mijar îro ne mijara Tirkiya bê teror e, mijar ya Tirkiyeke bê pirsgirêke ku pirsgirêka kurd tê de bê çareserkirin. Îro pêwîstî bi Tirkiya demokrat ku civaka wê hevgirtî be heye.

Pênasekirina Tirkiya bê teror şaş e, mijar ne ku mijara çekdanîn an jî daneyînin. Tevgera Azadiya Kurdistanê daxuyanî da û got em şerê çekdarî radiwestînin, pêwîst e dewleta Tirk jî li gor wê guhertinan bide çêkirin û mafê gele kurd bide û civaka demokratik ava bike. Di hemû zindiyan de pergala xweparastinê heye, ji ber wê jî kes nikare bêje ew civak ango ew zindî çima xwe diparêze, kilîtkirina her tiştê di mijara çekdayînê de tê wateya ku dewleta Tirk û Erdogan ne di ferqê de ne ku Tirkiye di rewşeke xirab de ye. Berya gotina çekdanîn, divê gavên zagonî bên avêtin.

**- Di avakirina civaka demokratik de çi berpirsiyartî dikeve ser milê civakê û ev pêvajo tenê bi piştgirîdayînê dikare bê meşandin?**

Çareserkirina pirsgirêkan û avakirina civaka demokratîk erka civak û gelan e. Ji bo ku pirsgirêk bên çareserkirin û civaka demokratîk were avakirin lazim e dewlet jî rê jêre re veke, eriş û hewildanên xwe yên tunekirinê bide rawestandin ku civak jî karibe bi erka xwe rabe. Avakirina civaka demokratik ne erka dewletê ye, erka hemû ferdên civakê ye. Heta ku civaka demokratîk û komînal neyê avakirin, em nikarin behsa azadî û demokrasiye bikin. Lazime were dîtin ku bi dewletan demokrasî çênabe, bi zagonan û bi çekan demokrasî çênabe. Demokrasî ancex bi guhertina hişmendiya ku tu di hundirê xwe de demokrat bî wiha dikarî pergala demokrat ava bike.

Avakirina civaka demokratîk ya ku baweriya wê bi demokrasiyê tê û lêgerîna wê a azadiyê hebe, lazime ji nûve xwe ava bike, şer û tekoşîna di navbera komîn û dewlet netew de ye. Komîn civaka rêxistinbûyî a ku xwe bi xwe rêve bibe û xwe rêxistin bike, paradîgma Rêber Apo jî xwe dispêre komînan. Dema ku civak hat cem hev û qedera xwe radestî tu desthilatdar û dewletan neke wê demê tê wateya ku em zêdetir giraniya xwe bidin avakirina komînan û civaka demokratik."

**- Banga Rêber Apo a " Aştî û Civaka Demokratik" û kongreya PKK'ê ji bo siberoja Sûriyê wê bandoreke çawa bike û di rewşa heyî de wê çi guhertinan bi xwe re bîne ?**

Sûriye ji 2011'an heta niha di nav şer û aloziyên mezin de dijî, ji sala 1963'an de partiya Baas li Sûriyê hikim dikir heta roja îro gelên Sûriyê bi tevahî di nava rewşeke pir xirab û aloz de jiyan dikir, taybet gele Kurd jî wek gelên din ji mafê xwe bêpar hatibû hiştin. Li ser Kurdan polîtîkayên pir taybet dihatin meşandin, bi armanca tunekirinê. Guhertinên ku di Sûriyê de çêbun û yên ku çêbibin pir girîng in. Pirsgirêka hundirîn a Sûriyê tenê girêdayî Sûriyê nîne, ji 2011'an ve ew aloziyên ku di Sûriyê de çêbûn faktorên navnetewî, heremî û dewletên derdor bandora wan di hundirê Sûriyê de heye û berdewam dike.

Di hiweşandina Rejîma Baas û hatina desthilata Şamê de rola dewleta Tirk sereke bû, derveyî wê jî komên girêdayî dewlata Tirk yên çekdar û yên din di jî di Sûriyê de aktivin. Ger li Bakur û Tirkiyê pêvajoya demokrasiyê dest pê bike û gavên erênî bên avêtin ew ê bandorê li Sûriyê jî bike. Dewleta Tirk çawa bi armanca tinekirinê nêzîkî Kurdên Bakûrê Kurdistanê dibû, wilo nêzîkê gele Rojava jî dibe. Dewleta Tirk ger bi Rêber Apo re û bi PKK'ê re gavên erênî bavêje û xwe biguhere wê nêzîkatiya wê ji bo Sûriyê jî bê guhertin. Tirkiyeke demokratîk nabe Tirkiyeke zilimkar û despot, ger guhertinekê bixwe re bide çêkirin nêzîkatiya wê li hemberî welatên cîran û Kurdan jî wê bê guhertin. Doza Kurd ji hev cûda nabe. Dewleta Tırk qebûl nake ku di Sûriyê de mafê Kurdan hebe, li ser Şamê zexteke mezin dike ku tiştekî nedin Kurdan û Sûriyê bi rengekî navendî were birêvebirin.

# Çi li cîhana me diqewime û çareserî çi ye?

**Volqan Elî**

Îsraîl pesna xwe dide ku wê bi 200 balafiran êrîşê Îranê kiriye û nizanim çend general û çend zanyarên wê yên nuklerê kuştin. Îran gefê lê dixwe ku ew ê tola xwe rake. Bi rastî bersiv jî da. Nayê zanîn şer wê bigihîje kîjan astê. Dîsa jî derket holê, gefên Îranê pir maneya wê tine; ya ku li pêşberê wê ne kolberekî (qaçaxçî) Kurd yan jî ne însanek ji rêzê yê/a Beluc, Fars e, jineke serhildêr e ku benê îdamê bixe qirqa wan û wan bixeniqîne yan jî guleyan lê bireşîne.

Li aliyekî hêzên dijî civakê ketine qirika hev, xwîna gelan dirêjînîn, gund û bajar û navçeyan hildiweşînin û li aliyê din jî însan û civaka ku ji hêzê, ji xwebûnê hatiye dûrxistin çavê xwe zîq kiriye, wekî berxê li ber kêrê, lê temaşe dike. Bi kurt û kurmancî ya diqewime ev e. Yekê bêje, "madem welê ye, ma çareseriya vî karî tine, wê her wisa berdewam bike? ". Na, çareserî jî heye û wisa jî dewam nake, divê neke! Çareserî neteweya demokratîk e. Yek ê bêjê, "ma ev neteweya demokratîk şivikekî bi sêhr e ku pirsgirêkên ewqas giran ên Îsraîl, Îran, Yahûdî û Misilmanan, pirsgirêkên ewqas giran ên cîhana me ya ji hal ketî (ji ber zexta Nemrut û Firawinên hemdem) çareser bike? Belê, mirov dikare bêje ji wê jî bêhtir e. Lê bi şert û merca ku hewldana me hebe, sebir û wijdan, zanebûn û hafiza me ya dîrokî bikeve dewrê.

Na! em ê behsa tewriyên cuda nekin! Rêbaza çareseriya neteweya demokratîk, ji dîrokê olan, pêxemberan, tecrubeyên qewm û qebîleyan sûd werdigire!

Olên cuda çawa karîne li cem hev, bijîn, ewliya, feylesof û pêxemberan ji vê re çi çareserî danîne, qewm, qebîle û eşîrên cuda çawa bi hev re bi hezaran salan heman erdnîgarî parve kirine, hestiyên kalik û pîrikên wan çawa tevlîhev bûne! Vaye rêbaza çareseriya neteweya demokratîk, dide li pey vê kevneşopiya dîrokê! Ne ku tewriyên pir sar û dûr ji civak û dîrokê ye; ne xewneke şevan e û ne jî xeyaleke bê esl e! Çareseriya demokratîk ji van hemû tecrûbeyên dîrokî encamê derdixe! Mînak; Hz. Mihamed piştî ku ji Mekkeyê hîcretî Medîne kir, li wir çi dît, bi kîjan pirsgirêkan re rû bi rû ma û ya herî girîng jî ew çawa çareser kirin? Dît ku li wê derê Yahûdî (Cihû) dijîn, Xrîstiyan dijîn, Pûtperest dijîn, jixwe Misilman jî nû çûne wê derê. Lê her olê, her qewmî li taxa ku jiyan dibûn derdora xwe bi dîwaran û bi sûran dorpêç kiriye, tê de sekinîne. Kes nikare biçe tax û herêma yê dîtir. Kî ji taxa xwe derkeve, yê din diçe ser wan û wan dikuje. Kes ji kesî re rêzê nagire!

Çi kir Hz. Mihamed? Ne got "Ez resûlê Xweda me, yan hûn ê werin ser ola min û bibin Misilman yan jî wê şûrê Îslamê li ser patika we be!" Çû banî hemû rûspiyên hemû ol û qewman kir; li hev civandin. Got ku her ol û qewm neçar e bi hev re, li cem hev bijîn. Her kes neçar e ji hev re rêzê bigire; Yahûdî li ser olê xwe, Xirîstiyan li ser olê xwe, Misilman bi olê xwe... her kes wê hev nas bike, ji hev re rêzdar be. Divê Ereb ji Yahûdî, Yahûdî ji pûtperest re, Xrîstiyan ji Misilmanan re, Misilman ji Xrîstiyanan re rêzdar be! Hemû sûr û dîwarên li bajêr hatin rakirin. Civaka bajêr xweş û geş bû. Medîne bi vê Peymanê bû Medîne.

Em ê piştî du hezar sal ji vê ezmûna dîrokî û pîroz çi encamê derxin? Em nikarin bêjin, "ew du hezar sal berê bû, Medîne wê demê bajarekî belkî nizanim çend hezar kesî bû, pirsgirêkên wê ne ewqas wekî îro giran bûn". Ne girînge rêbaza çareseriya pirsgirêkan e. Vaye vê rêbaza Peymana Medîne îro em jî wekî çareseriya neteweya demokratîk bi nav dikin. Çareseriya ku em îro dibêjin neteweya demokratîk çi ye? Hemû ol, hemû gel û netewe, hemû civakên cîhanê bila li cem hev di nava aştî û aramiyê de bijîn! Na eger wisa nebe çi li hêviya cîhana me ya pîr bûyî ye?

Di maneyekê de rast e ku îro, ev qîrîna ku em tê de dijîn ne wekî Medîneya Hz. Mihamed e. eger wê serdemê Peymana Medîne nebûya, dibe ku Yahûdiyên Medîne qira Erebên wê derê bianiya, yan Xirîstiyanan putperest tine bikirana yan jî çend qebîleyan çend olên cuda tine bikirana! Ewqas! Lê di sedsala 21. De Dewlet û îqtîdarên dagirker, bi çekên kîmyawî û atomî deriyên dojeha ku di hemû ol û baweriyan de heye, heta li ser piştê li cîhana me vekirine! Ma tamînata wê çi ye ku bi destê Îran, yan jî bi talîmata Trumpê deryaya hiş û aqil, çekên atomî li nav guhê gelan nekeve! Li pêşiya civakên cîhanê, pir zêde bijartek tine: Yan qiyameta dojehî ya kapîtalîzmê û yan jî çareseriya civak û neteweya demokratîk!



# 'Ji bo pêşxistina asta fikrê civakê parêznameyên Rêber Apo tên xwendin'

Endama Meclisa Bajarê Qamişlo Ayişa Elî anî ziman ku komînên bajarê Qamişlo bi hevkariya Kongra Star ji bo pêşxistina asta fikrî ya civakê, dest bi şêwirên xwendina parêznameyên Rêber Apo kir û ew ê heta ku Rêber Apo azadiya xwe ya fîzîkî bi dest bixe berdewam bikin.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Di çarçoveya "Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî ",3'ê Nîsana 2023"an de Roja Rojbûna Rêber Abdullah Ocalan de biryar hat girtin ku komên xwendina parêznameyên Rêber Apo werin çêkirin ku fikir û ramanê Rêber Apo ji nû ve di nav civakê de vejîn bikin, herwiha piştî Banga Rêber Abdullah Ocalan a ji bo Aştî û Civaka Demokratî, asta Xwendina parêznameyên Rêbertî bilindtir kirin. Ev xebat ji aliyê Kongra Star a Kantona Qamişloyê bi tayebet piştî nameya Rêbertî ji bo hemû jinan rêkir, hat destpêkirin. Kongira Star bi hevkariya Komînên bajarê Qamişlo ev xebat dane meşandin û wê xwendina pirtûkan heta ku Rêber Apo azadiya xwe ya fîzîkî bi dest bixe bidome.

Derbarê xwendina Parêznameyên Rêber Apo de Endama Meclisa bajarê Qamişlo Ayişa Elî ji Rojnameya me re axivî.



**'Komînên Qamişlo dest bi şêwirên xwendina parêznameyên Rêber Apo kirine'**



Ayişa Elî anî ziman ku wan dest bi xwendina paraznameyên Rêber Apo kiriye û wiha got:"Li komînên bajarê Qamişlo me dest birêxistinkirina şêwirên xwendina parêznameyên Rêber Apo kiriye, civînên me yên xwendina parêznameyan di heftiyê de me rojek iyar kiriye û em ê van civînên xwe dewam bikin heta ku Rêber Apo azadiya xwe ya fîzîkî bi dest bixe. Me dest bi xwendina beşa pêncan kir û mijara me li ser nasnameya kurdan e, di civînên me de pêkhateyên kurd û ereb amade dibin, ji bo ku her kes baş fêm bike em bi zimanê erebî dixwînin û bi zimanê kurdî nîqaşên xwe dikin."

**'Armnaca me ew e ku hişmendî were guhertin'**

Ayişa Elî axaftina xwe wiha qedand û got: "Armanca me ya sereke ji şêwirên xwendina Parêznameyên Rêber Apo ew e ku em fikrê Rêber Apo bighînin civakê û pêşxistina rola saziyên civakî ye, da ku bikarin bi têgihiştineke siyasî û exlaqî pirsgirêkên welatiyan çareser bikin, pêkhatina civakê werin fêmkirin, herwiha kesên beşdar xwe nas bikin, piştre civakê bi giştî nas bikin û hişmendî werin guhartin. Her kesê ku parêznameyên Rêber Apo bixwîne wê hewil bide ku bi têkiliyên yekser a bi civakê re û kûrkirina zêde ya di têgeha şaristaniya demokratîk de guhertinan çêke. Di riya fikir û felsefeya Rêber Apo de gelek guhertin di civakê de çêbû ku fikrên wî li ser civakek demokratîk û wekhev hatiye avakrin, ji ber wê em hêvî dikin ku her kes pirtûkên Rêber Apo bixwînin ji bo ku asta fikrên xwe li pêş bixînin."

## Dewletên netewe û hêzên serwer cîhanê dixin nav pêlên agir



**Zekî Bedran**

Bi êrîşa Îsraîlê ya li ser Îranê, hevsengiya li Rojhilata Navîn dê biguhere. Kêm, zêde dihat hêvîkirin ku Îsraîlê êrîş bike. Ev ji bo kesên ku herêmê dişopînin ne efsûnî bû. Rojhilata Navîn ji nû ve tê sêwirandin û ewlehiya Îsraîlê di bingeha vê yekê de ye. Îsraîlê bi eşkereyî got ku nexşeya herêmê dê biguhere. Kî dikare vê rêça wan bûyeran rawestîne?

DYA dixwest bi awayekî Îranê bikişîne nav hevsengiyê, lê Îranê tiştê ku dixwest ne pejirand. Ev yek bû sedem ku DYA ji bo êrîşan ronîya kesk bide Îsraîlê. Serokê DYA, Trump û berê jî, her tim digotin ku ew ê nehêlin ku Îran xwediyê çekên nukleerî bin. Îsraîl jixwe li benda derfetekê bû ku êrîş bike. Israîlê bidestxistina çekên nukleerî yên Îranê wekî gefek li ser hebûna xwe didît û bi berdewamî vê yekê dida nîşandan. Îranê her wiha dubare kir ku ew ê dev ji mafê xwe yê dewlemendkirina uranyûmê bernede. Eşkere bû ku ev yek dê rojekê bibe sedema pevçûnek rûbirû. Piştî şoreşa Îranê, stratejiya dabînkirina ewlehiya xwe li derveyî sînorên xwe weke xeterî dît.

Dema ku nekarî şoreşa Îslamî têkbibe, bi demê re komên girêdayî xwe ava kir û yên heyî piştgirî kir. Komên wekî Hizbullah û Hamasê ew kom bûn ku bi Îsraîlê re şer dikirin. Piştre Hûsî jî li van koman zêde bûn. Sûriye wekî eniyekê hate dîtin. Rejîma Baasê hate piştgirîkirin. Her wiha bi Hizbullah re bi awayekî çalak beşdarî şerê navxweyî yê Sûriyê bû. Li dijî Îsraîlê piştgirî da van hemû hêzan, ku jê re eniya berxwedanê dihat gotin. Îsraîlê xwe dorpêçkirî dît. Îsraîlê li Sûriyê gelek caran jî hêzên Hizbullah û Îranê armanc kirin. Ev yek teqez kir ku Îran tengav bû û ji sînorên Israîlê paşve kêşiya. Bi êrîşa Bahoza Eqsayê ya Hamasê Xeze wêran kir. Guh neda bertekên cîhanê. Ji ber ku hêzên DYA û Ewropayê li pişt wê bûn, li Îsraîlê ti pirsgirêkên teknîkî an çekan tuneye. Embarên DYA û hêzên din ji bo wê vekirîne. Pergala wan yên îstîxbarat û fezayê dihêle ku Îranê li gorî dilê xwe bişopîne. Rêber Apo di nirxandinên xwe yên berî çend salan de pênase kiribû ku Îran dê nikaribe vê rewşa xwe ya heyi demek dirêj biparêze. Rêber Apo digot ku ew ê Îranê di nav pergala kapîtalîst de entegre bikin. Rêber Apo anî li ser ziman ku divê Îran vebijarka demokratîk wekî bingeh bigire da ku pêşî li vê yekê bigire. Dema ku Iraq bêbandor bû û Sûriye jî di dawiyê de hilweşiya, Îranê texmîn kir ku ew ê hîn jî li ser piyan bisekine û bi rengekî rewşa xwe biparêze. Îranê ji destpêkê ve xeletiyek stratejîk a mezin kir. Ev veguherand xeteke siyasî. Îsraîl wekî dewletek ku pêdivî ye were hilweşandin armanc girt. Îsraîl dê çawa were tinekirin, were hilweşandin? Diyardeyekê teqez li holê de heye: Ew dewletek e ku di sala 1948'an de hatiye damezrandin û her ku diçe xurttir bûye, bi çekên nukleerî hatiye çekdarkirin. Piştgiriya tevahî ya pergala emperyalîst li pişt wê heye,bondara wan li Rojhilata Navîn jî hey e! Ger wê li şûna wê wekî dewletek nas bikira û teqez li ser hilweşandina wê nekira, nakokî ewqas kûr nedibûn. Îsraîl hîn jî dikaribû were rexnekirin, Filistînî dikarin werin piştgirîkirin. Lê dijberî û dijminatî ewqas kûr nedibû.

Îranê dijberiya xwe ya li hemberî Îsraîlê wekî amûrekê bîrdozî jî bi bandor bikar anî. Wê ew bi tevahî bikar anî, gotin di cih de be li gorî keyfa xwe, da ku girseyan di siyaseta navxweyî de di destên xwe de bihêle. Bê guman, wê her gav DYA li Îsraîlê zêde kir. Îranê ji bo avakirina bandorê li herêmê, parastina xwe û vekirina deverên serweriyê xebitî. Îranê di hundirê xwe de guhertinên demokratîk nekir. Rayedar û desthilatdarên Îranê destûr nedan avakirina civak û pergalek demokratîk di welat de pêşbikev e. Ev ji bingeha xisleta wê yê dewleta neteweyî ya navendî de derket. Ew li dijî kapîtalîzm û emperyalîzmê bû, lê wê modela dewleta neteweyî ya ku wan afirand û li ser Rojhilata Navîn ferz kir jî bi tundî bi cîh anî. Van nakokiyên kûr Îran gihandin rêyên bê encam ên ku îro pê re rûbirû maye. Modernîteya kapîtalîst bavê dewleta neteweyî ye. Wan nexşeya Rojhilata Navîn bi serwerekî xêz kir û rê li ber geşedanên îro vekir. Wan bi dabeşkirina gel û zêdekirina nakokiyan qûtiya Pandorayê vekir. Şer û pevçûn sedsalek e li herêmê rawestiyane. Bi sorkirina Îsraîlê li vê yekê, wan deriyê karesatên ku îro têne jiyîn vekirin. Eşkere ye ku pirsgirêk bi şerên serweriyê û bêçaretiya dewleta neteweyî çareser nabin. Ji ber vê sedemê ye, Rêber Apo çareseriya Neteweya Demokratîk pêşxist. Îsraîl û Filistîn neçar neman ku ewqas şer, wêranî û windahiyên madî jiyan kirin.

Ev her du gelan dikariyan di nava yekîtiyek demokratîk de di heman axê de bi hev re bijîn. Di wê demê de jî, ew ax dê wekî bihuştê hatiba dîtin û girêdanên yekîtî û baweriyê di navbera gelan de dê xurttir biban. Gel û pêkhateyên Îranê bi hev re bi azadî û ewletir jiyan kiriban. Eşkere ye ku rêya çareseriya bingehîn ew e. Dabeşbûnên olî û etnîkî, asêbûna di kevneşopiya serwer û dewletparêz de sedemên tirs û hovîtiya ku em îro dijîn in. Li Rojhilata Navîn guhertinek mezin di warê hişmendiyê de hewce ye. Parastina yekîtî û wekheviya gelan û pêşxistina vebijêrka demokratîk di pêş de di nav erka sereke ya civakê ye.

## Di şerê Îranê de helwesta gelan



**Farûk Sakik**

Bi salan e herkesî behsa şerê Îsraîl-Amerîka û Îranê dikir. Gelek caran tu kesî bawerî nedanî ku ev şerê rojek wê dest pê bike. Gelek bûyerên loqal-biçûk diqewimîn. Gef ji hev re dixwarin. Ambargo hebû. Dixwestin Îranê qels bikin. Dixwestin di nav Îranê de hêzek li dijî vê sîstema Îslamî serîhilbide hebe. Lê ev hêz tucarî nedîtin. Carna jî şer dihat qonaxeke wisa, me digot aha va evcar şer destpêdike. Lê moşekên balîstîk ên ji Îranê dihatin avêtin, kêlî bi kêlî herkesî li ser medya dijîtal temaşe dikir. Herkesî henekê xwe bi vî şerî dikir. Tu kesî bawernedikir wê şevek bi sedan balefir û fûze ber bi Îranê birêkevin.

Sibeha 13'ê hezîranê herkes bi vî şerê esasî şiyar bû. Îsraîl şer dabû destpêkirin û ev şer bi rojane jî dewam dike. Wisa dixuyê ku wê demek dirêj jî dewam bike. Di dawiya şer de Îsraîl û bloka xwe wê biserkevin. Îran wê winda bike. Rejîma Îslamî jî wê aqûbeta Sedam û Beşar bijî. Ev şer li dijî hilbirandina enerjiya nukleer falan nîne. Ev hincet in. Gotin; Sedam xwedî çekên kîmyewî ye, Beşar li dijî gelê xwe zilimkar e. Lê ev hincet vîzeya balafiran bû ku ber bi wan welatan bi rê kevin. Hatin şerkirin û li wê derê man. Îran wê çima winda bike? Dema Ayetullah Humeynî li heyatê bû di nesîhatek xwe de ji konsêya xwe re digot; heger hûn jî gel qût bibin û bersiv nedin daxwazên civakê hûnê 'aqûbeta Şah' bijîn. Herçiqas wî jî di salên rêveberiya xwe ya rûhanî de ev yek pêkneanî, piştî wî jî ji civakê û ji gelan dûrketin. Tucarî demokrasî nêzî vê axê nebû. Gelên li wê erdnîgariyê dijîn hatin înkarkirin û dibin sîstema şerîatê de Şiîtî derxistin pêş. Emê hîç behsa darvekirinan jî nekin. Ji ber van sedeman wê wenda bikê. Li pey xwe civakek ku di rojên zehmet yên şer de li kêleka dewleta xwe cîh bigirin nehiştine. Ji hêza herî bi bandor, hêza gel, mehrûm min.

Ev şer, eniyek ji şerê cîhanê yê sêyeme. Di rewşên defacto de hin hêz derdikevin û ji bo vê rejîmê biruxînin li firsetan digerin. Di germahiya şer de kêmasî-xeta û sûcên wan bi bîra wan dixin. Mixalefeta Îranê(ya siyasî) jî li benda vî şerî bû. Rejîma Îranê ya Îslamî divê îroj vî şerî ji xwe re wek şansek bibîne û bersiv bide daxwazên, civak, kolan û gelan. Dewleta Tirkiyê ji xwe re emsal bigire. Tirkiye ev şerê ku nêzî wan dibe dîtin û ji anha de behsa demokrasî û lihevkirina bi Kurdan re dikin. Paradîgmaya Rêber Apo yekane bersiva şeran dîtin û bi Abdullah Ocalan re serdemek nû dane destpêkirin.

Di vî şerê Îran-Îsraîlê de sekin û helwesta Kurdan jî tê meraq kirin. Kurd ji şer û serûbinbûna Îranê zewq nagirin; dixwazin rejîma Îranê rastiya ku bi salane bi wan re tê nîqaşkirin bibînin û li gor vê yekê gavan bavêjin. Kurd di vî şerî de ne alîgirin. Kurd bi du, kî mafdare û kî neheqe jî nakevin. Kurd bi xeta sêyemîn û bi hêzên demokrasiyê û gelên herêmê re bi du qedera xwe ketin e. Ev şer dişibê şerê Iraq û Sûrî. Di van herdu şeran de Kurd çawa ji bo azadiya neteweya xwe bi rêxistinbûn, îroj jî divê bi helwestek-seknek bi vî rengî tevbigerin. Li herêmê ji çek û şer zêdetir, pêdivî bi aştî û demokrasiyê heye. Divê ku herdu alî vê yekê bibînin.